**Pirtûk û medyayên din bi zêdetirî 50 zimanî**
**Pêşwaziya germ ji KUKIBU'yê Pirtûkxaneya St. Johann!**

***Pirtûkxane ji bo çi kesî ye?***
Her kes – zarok, ciwan, mezin.
Eger dixwazî pirtûkan bi deyn ji pirtûkxaneyê wergirî, karta pirtûkxaneyê wergire. Karta pirtûkxaneyê ji bo hemî pirtûkxaneyan li Pirtûkxaneya GGGyê ya Bajarê Baselê û ji bo pirtûkxaneya me ya dîjîtal derbasdar e.
Her wiha tu dikarî bêyî karta pirtûkxaneyê serdana vê pirtûkxaneyê bikî.
Gellek rûdan bi zimanên cihêreng hene.
Me WiFi, komputerên kesane, çapker, rawestgehên karî û odeyên komî, rojname û kovar hene.
Xwarin û vexwwarin rêpêdayî ye.

***Ez çawa dikarim karta pirrtûkxaneyê ji bo emanetgirtina babetan wergirim?***
Belgeyeke naskirinê ya biwêne nîşan bide. Hevkarên me dê kêfxweş bibin ku bijardeyên cûrbicûr, qanûn û lêçûnan ji te ra şirove bikin. Kart ji bo zarokan belaş e.
Tevahiya zanyariyan dikarî li vir bibînî: www.stadtbibliothekbasel.ch

***Ez çend babetan dikarim bi deyn û emanet wergirim?***
Herî pirr 15.

***Heta kengî ez dikarim babetan li ba xwe ragirim?***
Bi giştî bo mehekê. Tu dikarî roja vegerandinê di belgeya emanetê yan jî bi têketina nav hesabê xwe bi karta pirtûkxaneyê ya xwe bibînî. Gelo te hewcetî bi demeke zêdetir heye? Bi giştî derfeta dirêjîpêdana heyama emanetê heta sê mehan heye.
Tu dikarî babetan li her Pirtûkxaneyeke GGGyê vegerînî.
Eger babetan dereng vegerînî, dê sizaya derengkirinê hebe.

***Min karta pirtûkxaneyê winda kiriye. Divê ez çi bikim?***
Windabûnê bilez ji me ra ragihîne. Astengkirina kartê belaş e. Lêbelê ji bo dewsgirkirina karta nû lêçûn divê. Gelo te tenê karta xwe bi şaşî winda kiriye? Vêca IDya xwe ya biwêne ji bo emanetgirtina babetan nîşan bide. Tu dikarî karta xwe li sepana GGG City Library hilgirî.

***Rêzikên giring***
Li vir divê hemî hesta rehetiyê bikin. Xirecir neke û zibilan nerijîne û haya te ji serdanerên din hebe.
Ji kerema xwe bi baldarî digel babetan tev bigere. Di rewşa windabûn an zerardîtina babetan divê pereyekî bidî. Tu bixwe babetan neguherîne.

***Rêzik***
Gelo tu dixwazî pirtûkê vegerînî û piştrast nînî ku divê here ku derê? Pirtûkê bîne pêşberiya pirtûkxaneyê yan jî wê li ser mase yan textika sêpiyê dayîne.
Ji kerema xwe piştrast be ku hemî parçeyên lîstikên ser maseyê di dema vegerandinê da bi esehî hatibin bicihkirin.

***Gelo pirseke te ya din heye?***
Em tîmeke pirr-zimanî ne û kêfxweş dibin ku hin zanyariyan raberî te bikin.

Bibliothek St. Johann JUKIBU, Lothringerplatz 1, 4056 Basel, 061 322 63 19, stjohannjukibu@stadtbibliothekbasel.ch

GGG Stadtbibliothek Basel